# AGAHDARÎ BO PENAXWAZAN

Ji ber ku ûn bawer dikîn ku hûn nikarîn vegerîn welatê xwe ji ber xetera zilm, şerr an cebrê, we serlêdanek kir bo ku hûn mafê îltîcayê bistinîn li Lîtvanyayê. Ji dema şandina serlêdanê ve hûn vekî penaxwaz têne hesibandin. Ev hinek mafên taybetî dide we lê we ji berpirsiyariya şopandina daxwazên Destûra Bingehîn a Cumhurîyeta Lîtvanyayê, qanûn û kiryarên qanûnî yên din bernade. **Di vê pirtûkê de agahdariyên ku ji bo we girîng in hene, ji kerema xwe re wê nas bikin.**

**Agahiyeke berfirehtir di derbarê damezrandina welatê berpirsiyar di pirtûkoke taybetî ya din de hatiye qalkirin.**




## BERPİRSİYARİYA Jİ BO LEKOLÎNA SERLÊDANEKÊ

Rastiya ku we li Lîtvanyayê serlêdana îltîcayê kiriye, ne garantî ye ku serlêdana we yê li vir were lêkolîn kirin. Heger endamên we yên malbatê li welatekî din ê Yêkîtiya Ewropî hebin, ji welatekî din yê Yekîtiya Ewropî hatine Lîtvanyayê an vîzayek an destûreke berê ya wî welatî hebe, hingî dibe ku ew welat ji bo vekolîna serlêdana we ya îltîcayê berbirsiyar be. Di rewşeke wusa de, dibe ku serlêdana we neyê lêkolîn kirin û we transfer welatekî berpirsiyar bikin, ku paşî serlêdana we lêkolîn bike. Heke hate diyarkirin ku dive Lîtvanya li ser lêdana îltîcayê biryar bide, ev ê were wê wateyê ku hûn dikarin li Lîtvanyayê bimînin û selêdana we yê li vir were vekolandin. Hingî nirxandina serlêdanê we yê derhal dest pê bike.

## EZ Ê KENGÎ Û ÇAWA KARİBİM VEBÊJİM KU ÇİMA ÎHTİYACİYÊ MİN Bİ ÎLTÎCAYÊ HEYE?

Piştî şandina serlêdanê, memurên saziyê yak u we serlêdana xwe peşkeşî we kiriye yê **hevpeyvîna despêkê** bikin, evraqên we bigirin, wêneye we bikişînin û şopa tiliyên we bigirin. Armanca vê hevpeyvîna despêkê berhevkirina daneyên di derheqê we û endamên malbata we yên ku bi we re gihiştinê vir, riya gihiştina Cumhûriyeta Lîtvanyayê, daneyên têkildarî bo diyarkirina welatek Ewropî ye ku berpirsiyarê vekolîna serlêdana we ye, û her weha dîtina sedemên şandina serlêdanê û statûya we lin welatên din de ye.

Berî ku biryarekê li ser serlêdana îltîcayê bidin xebatkarên Departmana Koçê yê ji bo **hevpeyvîna bingehîn** bi we re bicivin, armanç ew e ku derfetekê bide we ku hûn ravekirineke hûrgulî ya sedemên ku hûn serî li îltîcayê didin û her weha her evraqên we yên ku we pêşî radest nekirine bidin, ku dikare çîroka we pişrast bike. Ji bo karkerekî Departmana Koçê ku yê pirsê dike, ev ê bibe derfetek ku ji we agahdariya hewce bistînin da hûn bigihîjin ka hûn hincetên dayîna îltîcayê, yên ku di qanûnên Cumhurîyeta/Komara Lîtvanyayê de hatine demezirandin bicîh tînin, û hem jî berhevkirina daneyên din ên ku ji bo biryargirtina serlêdana îltîcayê hewce ne. Heger hewce hebe, Departmana Koçê yê hevpeyvînekê din organize bike. Heger hewce be, di hemî hevpeyvînan de ji we re tercûmanêk belaş bê dayîn.

## KÎ Û ÇAWA YÊ SERLÊDANA MİN LEKOLÎN BİKE?

Lo gorî qanûnên Cumhurîyeta Lîtvanyayê, berî ku biryarek li ser serlêdana îltîcayê were dayîn, dive nirxandineke berfireh, serbixwe, û bêalî were kirin. Nirxandina serlêdana ji bo îltîcayê pêvajoyeke îdarî ya tevlîhev e ku bi danasîneke berfireh a ku ji hêla qanûnan ve hatiye pêşkêş kirin. Serlêdana we yê were nirxandin biryar yê ji aliyê Departmana Koçê ve were girtin. Departmana Koçê yê agahdariya ku we şandiye lêkolîn bike û di derheqê şert û mercên ku hûn serlêdana xwe bingeh digirin de agahdariyên din berhev bike. Dema ku hemî agahiyên hewce hatine berhev kirin, Departmana Koçê yê binerxîne ka hûn şertên dayîna îltîcayê tînin cî an na, wekî ku di qanûnên Cumhurîyeta Lîtvanyayê de hatine diyar kirin, û yê biryareke maqûl bide. Hûn ê hemî biryarên di derheqê xwe de ji aliyê Departmana Koçê ve hatine dayîn bistînin.

**DEMA KU EZ Lİ BENDA BİRYARA DEPARTMANA KOÇÊ BİSEKİNİM EZÊ Lİ KU DERÊ BİMÎNİM?**

Di dema vekolîna serlêdana we de, mafê we heye ku hûn li Lîtvanyayê bimînin. Heke we serlêdana xwe ji xala kontrolê ya li ser sînor an li herema transit re şandibe, hingî, di hinek rewşan de, bibe ku ji we were xwestin ku hûn li saziya ku we serlêdana xwe kiriye li benda biryara Departmana Koçê bisekinin. Wekî din, heke hûn dil bikin, dibe ku destûr bidin we ji bo ku hûn li cihekî din ê bijartî li xaka Lîtvanyayê bi perê xwe bimînin. Heke hûn cihê rûnistina xwe biguherînin, dive hûn derhal bi xebereke nivîskî heya Departmana Koçê pê bixin. Heke hûn bi serê xwe nikarin mesrefên cihê mayîna xwe bidin, Departmana Koçê yê we li navenda razanê ya penaxwazan bi cî bike, li vê derê hûn ê karibin bimînin û xwarinê peyde bikin, alîkariya pere ji bo lêçûnên piçûk, alîkariya tibî ya acîl, alîkariya derûnî û karûbarên civakî bistînin. Di rewşekê ku diyar dike ku ji ber hinek şert û mercên sedemên kesanê hûn zeîf in an hewcedariyên weyên taybêtî hene, ji bo ev hewcedariyên peyda bibin hûn ê werin qebul kirin.

**YÊ PARÊZER BEŞDARÎ HEVPEYVÎNA MİN BİBE?**

Heke hûn bixazin, hûn dikarin parêzerek davet bikin ji bo ku we di civîna bi karkerên Departmana Koçê an saziyên din yên Lîtvanyayê de temsîl bike. Heke hûn bixwazin ku parêzerek beşdarî hevpeyvîna we bibe, lê hûn nikarin mesrefên alîkariya hiqûqî bidin, ji kerema xwe re heya saziya ku hevpeyvînê dike pê bixin. Di rewşeke wusa de, karûbarên parêzer yê belaş bidin we. Hûn dikarin alîkariya hiqûqî ji saziyên ne-hikûmîyên ku alîkariya penaxazan dikin jî bixwazin, mînak ji Civaka Xaça Sor a Lîtwanî, ku agahdariya tekiliyê di vê pirtûkokê de tê peyda kirin. Ji kerama xwe re bila di aqilê we de ku bêşdarîya parêzer we ji peywira ku hûn bi serê xwe beşdarî hevpeyvînê bibin û hemî agahdariyên hewce radest bikin miaf nagire.

**LAZİME KU EZ DİYAR BİKİM Çİ QAS PEREYÊ MİN HEYE?**

Erê, li ser şandina serlêdana îltîcayê dive hûn fonên li cem xwe diyar bikin û her weha di derbarê hemî dahatên ku hûn distînin bi nivîskî Daîreya Koçê piştî ku we sitand di nava 3 rojên kar de agahdar bikin (ji xeynî alîkariya ku didine penaxwazan). Di rewşa ku were saz kirin ku ji bo karûbaran fonên we têra we dikin, tiştên ku belaş hatine dayîn (tevlî heqê cihê razanê û alîkariya hiqûqî), hûn ê mecbûrî lêcûnên ku devletê kitire bidin.

**BİRYAR ÇÎ QAS DEM DİSTÎNE?**

Bİ gelemperî, serlêdana îltîcayê tê nirxandin û ji roja serlêdanê ne derengî 3 mehan biryar tê girtin. Heke ku ihtîyacê Daîreya Koçê bi bi demekê direjtir hebe ji bo ku serlêdana we rêkûpêk binirxîne, hûn ê di derbarê vê yekê de tavilê agahdar bibin.

**HEVKARÎ Bİ DEPARTMANA KOÇÊ RE**

Kalîteya nirxandina ku ji hêla Daîreya Koçê ve tê çêkirin û rastdariya biryara ku tê dayîn ne tenê bi pisporiya pîşeyî ya karkerên Departmanê ve girêdayî ye, lê her weha bi hewldanên ku we ji bo pejiranina serlêdana xwe kirine jî girêdayî ye. Ji bîr nekin ku yên ji bo alîkariyê serî li me didin hûn in; ji ber vê yekê, em hêvî dikin ku hûn bi nîyetekê baş tevbigerin, bîhnfireh bin û rêzê ji qanûna Lîtvanyayê re bigirin. Divê hûn di dema lêkolîna serlêdana xwe de hevkariyê bi Daîreya Koçê re bikin û di demekê diyarkirî de beşdarî civînan bibin, dema ku hûn behsa sedemên dixwaza îltîca dikin samîmî bin û hemî evraqan, ku dikare çîroka we piştrast bike, zutirîn radest bikin. Heke hûn nikarin tu evraqan radest bikin jî, Departmana Koçê yê bigihîje çîroka we û dibe ku biryar bide ku mafê îltîcayê bide we heke çîroka we berfireh, hevgirtî, bihevre û maqûl be. Heke hûn di dema vekolîna serlêdana xwe de bi Daîreya Koçê re hevkariyê nekin, neyên rendevûyan an bersivkirina pirsên ku di hevpeyvînan de têne pirsîn red bikin, agahdariyên girîng an evraqên tekîldar veşêrin, evraqên sextê yan xapînok bişînin, agahdariyên çep, bi riyeke din nirxandina dosya xwe asteng bikin, Departmana Koçê dibe ku di derbarê pêbaweriya we de qumanên maqûl bike û ji ber vê yekê jî dikare îltîcayê nede we.

**VEKOLÎNÊN DİN**

Heke qumanên maqûl yên Departmana Koçe di derbarê temenê we an tekilîyên malbatî bi kesên ku bi hev re hatine an bi hev re li Lîtvanyayê dimînin hebin, dibe ku diyarkirina temenê an testa DNAyê ji we were xwastin. Her çi qas redkirina testeke wusa dibe ku bandoreke neyînî li ser nirxandina çîroka we bike, ev test tenê bi razîbûna we dikarin were kirin.

Heke sedemên we yên serlêdana îltîcayê bi şîdeta laşî ya berê ve girêdayî be, Departmana Koçê dikare ji we re pêşniyar bike hûn di muayeneya bijîşkî re derbas bibin, lê hûn bawer bikin ku encamên vekolîneke wusa dikare çîroka we rast bike, mafê we heye ku hûn bi însiyatîfa xwe lêçûna xwe vekolînek bijîşkî çê bikin û her weha encamên wê bişînin Departmana Koçê.

**KÎ YÊ KARİBE XWE BİGİHÎNE AGAHDARİYA KU MİN Dİ SERLÊDANA XWE DE PÊŞKÊŞ KİRİYE?**

Her çi qas biryara li ser serlêdana ji bo îltîcayê yê aliyê Departmana Koçê were dayîn, saziyên devletê yên din ên Lîtvanyayê jî beşdarî pevajoya îltîcayê dibin û dibe ku, heke hewce be, xwe bigihînin agahdariya ku we

pêşkêş kiriye. Lêbelê, ev agahdarî yê neyê eşkere kirin an ji welatê we re neyê şandin. Ji ber ku we serlêdana îltîcayê li Lîtvanyayê kiriye û sedema serlêdana we ji hêla Departmana Koçê an ji hêla saziyên din yên devleta Lîtvanyayê, parêzer an tercumanên ku di pêvajoyê de alîkariya we dikin ve nayê eşkere kirin. Hemî kes û saziyên ku nave wan derbas bûn neçar in ku nepenîtiya agahdariyên ku we danê misoger bikin û ji ber eşkerekirina wê yê berpirsiyar bin.

## EZ Ê Dİ DEMA VEKOLÎNA SERLADANÊ DE KARİBİM BİXEBİTİM AN HERİM DİBİSTANÊ?

Ji ber ku di serlêdana ku we şandiye de mafê xebatê tune ye, di dema vekolîna serlêdana îltîcayê de hûn ê nikaribin bixebitin. Heke zarokên we yên piçûk hebîn an hûn bi xwe piçûk bîn, ji kerema xwe re ji bîr nekin ku **penaxwazên piçûk mafê wan heye ku herin dibistanê an saziyên ku perwerdahiya kar didin.** Ji bo ku vî mafî bikar bînin, ji kerema xwe re bi karkerê civakî yê navenda rûniştinê re an nûnerên rêxistinên ne-hikûmî yên ku alikariya penaxwazan dikin re bikevin têkiliyê.

## Lİ BENDA BİRYARA DEPARTMANA KOÇÊ YA DERBARÊ SERLÊDANA WE BİSEKİNİN

Heke hûn di dema vekolîna serlêdana we ya bo îltîcayê ji Lîtvanyayê derkevin an Departmana Koçê ji bo hin sedeman nikaribe bi we re bikeve têkilîyê, vekolîna serlêdana we yê were sekinandin. Ev tê wê wateyê ku Departmana Koçê yê nikaribe vekolînê biqedîne û biryarekê li ser serlêdana we bide. Pişt re, vekolîna serlêdana we dikare were bidawîkirin û di vê rewşê de hûn nûvekirinê bixwazin jî vekolîn nayê nû kirin. Her serlêdana nû ya îltîcayê ku hûn ê bişînin yê weke serlêdaneke paşîn were hesibandin û dibe ku di bin prosedureke tundtir de were vekolîn kirin. Heke hûn bawer dikin ku îhtîyacê we bi îltîcayê heye, ji kerema xwe re li benda biryara Departmana Koçê bin. Heke hûn biryar bidin ku hûn li benda biryara Departmana Koçê nesekinin û li welatekî din ê Yekîtîya Ewropî serî li îltîcayê bidin, ew welat dibe ku we wegerîne Lîtvanyayê ji bo ku hûn li vê derê vekolîna serlêdana xwe biqedînin. Hekê hûn edî naxwazın ku îltîca bikin li Lîtvanyayê, ji kerema xwe re bi nivîsê heya Departmana Koçê pê bixin. Di rewşekê wusa de, serlêdana we edî hev vekolîn dibe û hûn ê mecburî vegerin welatê xwe.

## EGER EZ Bİ BİRYARA KU Jİ HÊLA DEPARTMANA KOÇÊ VE HATÎ DAYİN RE NE HEM FİKİR BİM EZ DİKARİM Çİ BİKİM?

Heke hûn bi biryara ku hêla Departmana Koçê ve hatî dayîn re ne hem fikir bin, ji wergirtina vê biryarê vê hûn dikarin di nava 14 rojan de serî li Mehkema Îdarî ya Heremî ya Vilniusê bidin. Serlêdana di dema nîşankirî de pir girîng e. Di dema pêvajoya îtîrazê de, mafê we yê alîkariya hiqûqî, eger hewce be, karûbarên wergêrê heye. Wateya alîkariya hiqûqî ew e ku yê mafê we heye ku hûn parêzerek bigrin, yê kû ewraqên we amadê bike û di mehkemê de we temsîl bike. Eger hûn dixwazin ku îtîrazî biryara Departmana Koçe bikin lê hûn dikarin lêçûnên alîkarîya hiqûqî bidin, ji kerema xwe re bi Departmana Koçê re têkilî deynîn.

## EZ DİKARİM Bİ HEMAN AWAYÎ Lİ DIJÎ BİRYARA BİNÇAVKİRİNA XWE ÎTÎRAZ BİKİM?

Departmana Koçê li ser binçavkirinê biryar nade û bi pirsgirêkên binçavkirine re eleqedar nabe. Eger hûn hatibin binçavkirin, ev tê vê wateyê ku biryar ji hêla dadgehê (mahkeme) ve hatiye dayîn û tenê dadgeh dikare wê biguherîne. Di rewşa ku hûn ji biryara girtina xwe ya ku ji hêla dadgehê ve hatiye dayîn ne razî ne, mafê we heye ku hûn li dijî vê biryarê serî li Dadgeha Îdarî ya Bilind a Lîtvanyayê bidin. Heke ji bo binçavkirina sedemên maqûl hebûya, lê li gorî we ev sedem ji zû ve winda bûne, mafê we heye ku hûn serî li Dadgeha Heremî ya cihê ku hûn lê dimînin bidin ji bo ku biryara binçavkirina we ji nû ve binirxêne. Di dema van pevajoyan de, mafe we ji bo alîkariya hiqûqî, eger hewce be, wergêrî heye. Heke hûn dixwazin îtîrazî biryara binçavkirinê bikin lê lêçûnên alikariya hiqûqî nikarin bidin, ji kerema xwe re bi Departmana Koçê re têkilîyê deynin.

## AGAHDARİYA TÊKİLİYA GİRÎNG:

**Departmana Koçê**
L. Sapiegos str. 1, 10312 Vilnius,
Tel. +370 5 271 7112
E-mail: info@migracija.gov.lt
http://www.migracija.lt

**Navenda Tomarkirina Biyaniyan**
Vilniaus str. 100, 18177 Pabradė, Švenčionys district
Tel. +370 3 87 53401
E-mail: urc.sekretore@vsat.vrm.lt

**Navenda Pêşwaziya Penaberan**
Karaliaus Mindaugo str. 18, 55283 Rukla, Jonava district
Tel. +370 3 497 3377, +370 698 48776
E-mail: centras@rppc.lt
http://www.rppc.lt

**Ofîsa Komîseriya Bilind a Penaberan a Neteweyên Yekbûyî (UNHCR) li Komara Lîtvanyayê**
A. Jakšto str. 12, 01105 Vilnius,
Tel. +370 5 210 7416
E-mail: kules@unhcr.org
http://www.unhcr.se/lt/home.html
*UNHCR di derbarê prosedur û alikariya penaberiyê de li Lîtvanyayê li penaxwaz û penaberan re agahî û şîretan peyda dike.*

**Nivîsgeha Vilnîus ya Rêxistina Koçê ya Navneteveyî**
A. Jakšto str. 12, 01105 Vilnius
Tel. +370 5 261 0115
E-mail: iomvilnius@iom.lt
http://www.iom.lt
*IOM alikariya kesên ku dixwazê bi dil vegere welate xwe dike. Ev alikarî li gora hewcedarî û rihetiya vî kesî têne kirin ji bo ku bi rêvîtiyeke ewlehî û bi selametî karibe vegere mala xwe. IOM di heman demê de alikariya nû-entegrasyonê ji bo kesên ku hewceyê alîkariyê ne ku li welatên xwe bicîh bibin jî dike.*

**Çivaka Xaça Sor a Lîtvanyayê**
A. Juozapavičiaus str. 10A, 09316 Vilnius,
Tel. +370 5 212 7322, +370 686 30050
E-mail: info@redcross.lt
http://www.redcross.lt
*Civaka Xaça Sor a Lîtvanyayê hem alikariya hiqûqi û mirovî hem jî alikariya şopandina endamên malbatê û naskiriyên wan dike.*

**Caritas of Vilnius Archdiocese**
Odminių str. 12, 01122 Vilnius
Tel.: +370 5 261 1014
E-mail: info@vilnius.caritas.lt
http://www.vilnius.caritas.lt

### MAF Û PEYWİRÊN PENAXWAZAN Lİ KU DERÊ TÊNE DİYATKİRİN?

Maf û peywirên penaxwazan yên ku pirtûkokê de derbas dibin, di paragrafên 1-3'an ên benda 71'ê a Qanûna Rewşa Hiqûqî ya Biyaniyan a Komara Lîtvanyayê de hatine saz kirin:

**Article 71. Maf û Peywirê Penaxwazek li Komara Lîtvanyayê**

1. Penaxwazek xwediye mafên wusa ye li Komara Lîtvanyayê:
1) karanîna mercên pêşwaziya material, dema ku li cihen mayînê yên ku ji hêla Saziyên Komara Lîtvanyayê hatine veqetandin, cihên binçavkirinê û her weha xalên kontrolê li deverên sînor û derbasbûnê;
2) sitandina agahdariya belaş di derheqê maf û peywiran de hem jî encamên neguhdana bi wan re di dema vekolîna serlêdanê ji bo dayîna îltîcayê, û her weha agahdariyên bi vekolîna serlêdana dayîna îltîcayê ve girêdayî;
3) birêvebirin û fermîkirina evraqên noterkirîyên têkildarî vekolîna serlêdana îltîcayê;
4) karanîna alîkariya hiquqîya ku ji hêla dewletê ve hatiye garantîkirin, di rêza ku ji hêla Wezirê Karên Hundir ve hatîye diyarkirin;
5) wergirtina tezmînatê ji bo karanîna rêyên veguhastina giştî ku ew karanîn bi vekolîna serlêdanê ji bo dayîna îltîcayê ve girêdayîye;
6) karanîna karûbarên wergêra belaş;
7) sitandina lênihêrîna tibîya acîl alikariya derûnî û karûbarên civakî li Navenda Tomarbûna Biyaniyan an Navenda Pêşwaziya Penaberan;
8) wergirtina alikariya dravîya mehane di miqdara ji sedî 10 dahata darayîya dewletê bi awayê ku ji hêla Wezîrê Ewlehiya Civakî û Kar û Wezîrê Hundurîn ve tê danîn;
9) serlêdana nûnerên Komîseriya Bilind a Penaberan a Neteweyên Yekbûyî û rêxistinên din, yên ku ji bo penaxwazan alikariya hiqûqî sewirmendiyên pispor peyda dikin û bi wan re di bin şert û mercan de dicivin, ya ku yê nepenîtiyê misoger dike (xalên kontrolê yên deverên sînor an ên derbasbûnê jî tê de);
10) Piştî ku ji bo kesên mexdur hate wezîfedarkirin, ji bo mercên pêşwaziyê bikar bînin, ya ku yê hewcedariyên wan ên pispor bicîh bîne;
11) karanîna şert û mafên peşwaziyê yên din, ku ji wî re têne garantîkirin, li pey peymanên navneteweyîyên Komara Lîtvanyayê, qa nûn û kiryarên din ên hiqûqî;

2. Serîlêderên îltîcayê yên ku piçûk in, mafê wan heye ku li dibistanên li dû xwendina giştî an bernameyên pîşeyî bixwînin, li pey rêzê, ji hêla Wezîrê Perwerde û Zanistê ve hatîdamezrandin. Ev maf divê di cih de were bi karanîn ne derengî di nav 3 mehan de ji roja şandina serlêdanê ya ji bo dayîna îltîcayê. Penaxwazek yê ku bi piçûkî dest bi xwendinê kir mafê wî/wê heye ku perwerdeya giştî an bernameyên kar biqedîne, di rewşekê wusa de jî, eger mezin bibe jî dikarê bixwîne.

3. Peywirên penaxwazek:
1) piştgiriya Destûra Bingehîn, qanûn û kiryarên din ên qanûnîyên Komara Lîtvanyayê;
2) pêkanîna peywirên ku ji hêla Deparrtmana Koçê û biryarên dadgehê ve ji penawax re hatine dayîn;
3) bihêlin ku vekolîna tenduristiyê were kirin;
4) hemî evraqên bedrest ravekirina tevahîya rastîn a sedemên serlêdana dayîna îltîcayê radest bikin, kesayetiya serlêderê îltîcayê û her weha mercên ketin û mayîna wî li Komara Lîtvanyayê û hevkarîkirina karkerên sivîl û karkarên saziyên jêhatî di dema vekolîna serlêdana îltîcayê de;
5) di dema pirskirina saziyeke dewletê an rexistinekê de, yaku serlêdana biyaniyan ji bo dayina îltîcayê stand, ji bo çavkanî û hebûnên li Komara Lîtvanyayê xwedî derketî bi nivîskî beyan bikin û hem jî bi formata fonên belaş ji Departmana Koçê re bi nivîskî ragihînin, ku di heyama ku maf hatin dayîn de bimîne li Komara Lîtvanyayê û di nav sê rojan de piştî stendina wan hat dayîn;
6) di rewşa ku Departmana Koçê biryar da ku destûra rûniştinê li cihê bijartî bide, derhal guhertinên derbarê cihê rûnistinê ji Departmana Koçê re bêjin.

**Di vê pirtûkokê de agahdariyên kurt yên di derheqê pevajoyên dayîna îltîcayê, maf û peywirên sereke yên penaxwazan û her weha encamên gengaz ên ku van peywiran bicîh nayîne hene. Ji ber ku ev bi serê xwe tu maf û peywirên hiqûqî naafirîne, armanca yekane ya vê pirtûkokê peydakirina agahdariyê ye. Heke hûn ji xeynî van agahdariyên ku di vê pirtûkokê hene hewceyî agahdarîyên zedetir bin an hûn dixwazin ku di derbarê nirxandina serlêdana xwe de bêtir agahdar bin, ji kerema xwe re bi Departmana Koçe re têkilî deynin.**